



*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 29**

# 1 - Bûyerên pêş pêkhatina şoreşa Babekê Xûramî

Hên ji destpêka sedsala 3-yan goçî (9-an z.) şoreşeka kurdî ya berfireh li dijî dewleta *Xîlafeta Ebbasî* pêkhat û li beşekî mezin yê rojhilatê Kurdistanê (bakur-rojavayê Îranê) û li hin herêmên kurdan li Azerbeycan û rojhilatê Ermîniya belavbû. Hin gelên din yên *Ariyanî* jî beşdarî vê şoreşê bûn. Xortekî kurdî leheng rêveberiya vê şoreşê kir ku bi navê **Babek** hate naskirin û pê navdar bû. Gelo rah û damarên vê şoreşê çi bûn? Rêveberên wê kî bûn? Bûyerên wê çawa derbas bûn? Û dawiya wê çawa bû? Eve mijara me ya niha.

## Rewşa gelên Ariyanî:

Berî peydabûna Îslametiyê, welatê Kurdan di bin dagîrkariya farisî da bû û civak ji du çînên sereke pêkdihat:

**- Ya yekem**, ji çîna arîstokrata derebeg ya serdar, li gel wê çîna xwedî hebûnên biçûk (Dehaqîn) û serdarên herêman (wilayetan), rêveberên leşkerê û mezinên oldaran pêkdihat.

**- Ya duwem**, ji çîna bindest û zorlêkeran - ji cotkar, kirêkar û koleyan pêkdihat.

Di wê heyamê da gel di bin zordarî, çewsandin û stûxwariyê da dijiyan. Bac û salaneyên giran, xerac û cizye, diyariyên cejnên Newroz û Mehrecanê barê wan pir giran kiribû. Bi encama vê rewşa kambax du tevgerên ayînî peydabûn; yek ji wan *Manewî* bû û ya din jî *Mezdekî* bû[1].

Talankarên Erebên Misilman sala 16-ê goçî (637-ê z.) gihîştin Kurdistanê. Li başûrê Kurdistanê şer û pevçûnên mezin yên hebûn û nemanê di navbera Ereb û Farisan da pêkhatin (şerê *Celûla* û şerê *Nehawend*)[2]. Di encama van şeran da gelek şûn û war hatin kavilkirin, gelê pir herêman têkçû û qeliya; ji bilî êrişên dizî û

[1] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 2/151. Al Bayroni, Al Athar al Baqiye e'n al qurun al Khaliye, çapa libzek, 1878, rûpel 216.
[2] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 4/23. Ibin Al Athir, El-Kamel fi al Tarix, 2/390. Al Maqdisi, Al Bidih we al Tarix, 5/181.

talanê ku talankarên Ereb pê radibûn. Gelên herêmê jî, ti qezenceka wan ji talana erebî tinebû; ji bilî ku ew ji bin pença dagîrkarekî kevin derbasî bin şûrê dagîrkarekî nû bûn, yê ku angaşt dike, Xweda ferman daye wî, Îslametiyê bi darê zorê, bi zora devê sûr (şemşîr) belav bike.

Di heyama *Dewleta Umewî* da ev zordariya li ser gelan hên tûjtir bû. Xelîfeyên *Dewleta Umewî* siyaseteka nijadpereta tund birêve birin, bi darê zorê zimanê erebî di hemû fermangeh û dezgehên dewletê da, di her warekî da û li her herêmekê kirin zimanê fermî. Kesên ne Ereb wek mirovên kêmnirx didîtin, bac û salane li ser wan girantir dikirin, cizye ji kesên ku ji ber van barên giran Îslametî pejirandibûn jî dibirin. Mohr li stûyê cotkarên mewalî (kesên ne Ereb) dixistin daku ji ber bacê ji gundên xwe baznedin. Zeviyên herî bi xêr û bêr ji xwediyên wan distandin û didan alîgirên xwe. Pal û pişta xwe didan derebegên mezin û bi rêya wan vê siyaseta xwe ya zor û çewsandinê pêkdihanîn[3].

Wek encama gotinê, gelên ne Ereb di bin du şêweyên zordariyê da dinalîn:

**- Ya yekem**, zordariyeka nijadperest ku Ereban tevaya serdariya jorîn (xîlafet) û hemû astên rêveberiyê di destên xwe da digirtin, çand û kultura gelên din tineyî dikirin.

**- Ya duwem**, zordariyeka civakî û aborî di hemû warên jiyanê da pêkdihanîn.

Bi encama vê siyasetê, Mewalî (gelên ne Ereb) tev li şoreş û serhildanên li dijî dewletê dibûn; bi taybetî jî şoreşên *Xewaric* û *Şî'eyan*. Malbata *Ebbasî* ev rewş ji bo berjewendiya xwe bikar anî, Mewalî kirin leşker û li dijî dijberên xwe yên *Umewî* xistin dewrê û wisa *Dewleta Umewî* ji holê rakirin û *Dewleta Ebbasî* avakirin (li babetên rêberê Kurd *Ebo Muslimê Xurasanî* binêre).

## Şoreş û Serhildanên gelên Ariyanî:

Li dor salên 137-ê goçî (754-ê z.) guhartineka girîng û berbiçav di şoreşên gelên *Ariyanî* yên bindest da pêkhat. Li cihê ku di bin rêveberiyeka erebî dijber da serî hildin, yan jî têkevin nav rêzên tevgerên olî-îslamî, hin rêberên *Ariyanî* niştîmanperwer peydabûn û tevgerên şoreşgerî birêve birin. Ji wan tevgeran, yên here navdar evin:


**1- Şoreşa Sunbaz**: Ev şoreş di sala 137-ê goçî (754-ê z.) da li Xurasanê, bakurê Îran û bakur-rojavayê Îran (herêmên kurdî) pêkhat. Ev tevger tevgereka gelêrî-cotkarî bû. Piraniya şoreşgeran ji herêma Çiyan bûn, li başûr û rojhilatê Kurdistanê zorbeya wan Kurd bûn. Di wê salê bixwe da, rêberê Kurd *Ebo Muslimê Xurasanî* bi doxmanî (îxanetî), bi dek û dubareya xelîfeyê *Ebbasî Ebo Ce'hfer El Mensor* hatibû kuştin. Ev şoreşa han wek bersivekê bû li ser kuştina *Ebo Muslim*. Rêberê vê şoreşê mirovekî mecûsî ji herêma Nîsapûrê bû. Şoreşgeran herêmên fireh li Xurasanê xistin bin destên xwe û pêra şoreş gihîşte rojhilatê Kurdistanê. Lê mixabin xelîfe *El Mensour* ev şoreş di xwînê da perçiqand, dora 60000 (şêsthezar) şoreşger kuştin ku piraniya wan ji herêma Çiyan bûn; jin û zarokên wan kirin

[3] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 5/619, 6/127. Al Belazuri, Futuh al Buldan, rûpel 387.

sebiye û li bazarên koleyan hatin firoştin. Rêberê şoreşê Sunbaz jî, piştî ku bazda herêma Teberistanê (li bakurê Îranê), hate kuştin[4].

**2- Şoreşa Ustazsîs**: Ev şoreş di sala 149-ê goçî (766-ê z.) da li Xurasanê bi rêveberiya *Ustazsîs* pêkhat. Ev jî tevgereka gelêrî berfireh bû û dora 300000 (sêsedhezar) şervan tevlê bûn. Piştî şerên gelek giran li dijî leşkerên *Dewleta Ebbasî* ev şoreş jî hate vemirandin. Hinek dibêjin ku dora 70000 (heftêhezar), hinek jî dibêjin dora 90000 (nodhezar) kes hatin kuştin û 14000 (çardehhezar) kes hatin dîlkirin û piştî dîlkirinê hemû jî hatin kuştin. li dora 30000 (sîhhezar) şoreşger xwe gihandin çiyan û di pey ra xwe spartin êrişkeran. Dibêjin ku ew serbest hatin berdan, lê rêveberê wan *Ustazsîs* hate daleqandin[5].

**3- Şoreşa El Muqenne'**: Ev şoreş jî li Xurasanê di sala 160-ê goçî (776-ê z.) da pêkhat. Ev şoreşeka gelêrî û gewre bû. Bi aliyê rojhilat da gihîşte Ozbekistanê. Ji rêberê vê şoreşê ra *Haşim Bin Hekîm* bi lexem *El Muqenne'* digotin, ji ber ku rûpûşek (maskek) dida ser rûyê xwe. Ev mirov ji çîna kirêkar bû, bi veguhartina giyan bawerdikir û tê gotin ku wî xwedawendî angaşt kiriye (Îddî'a). *Xûramiye* (alîgirên ayîna *Yezdanî*) li Afganistan û Ozbekistanê tevlî vê şoreşê bûn. Ji wan ra yên sipîkirî digotin, ji ber ku cil û bergên wan bi rengê sipî bûn û alayên wan jî bi rengê sipî bûn. Vê şoreşê metirsiyek li ser *Dewleta Ebbasî* peydakir. Piştî pir şerên giran ev şoreş jî di sala 163-goçî (779-ê z.) da hate vemirandin. Rêberê şoreşê *El Muqenne'* di keleha *Keşû (Kiş)* da hat dorpêçkirin û nexwast ku xwe bi ti awayî bispêre dijmin. Gava ti çare nedîtin, agirekî xurt pêxistin, hem wî, hem malbata wî û hem jî alîgirên wî hemiyan xwe avêtin nava agir. Hinekan jî gotiye ku jehir vexwarin. Pend û weseka *El Muqenne'* ew bû ku termê (laşê) wî bê sotandin û nekeve destê dijmin. Ev helwesta qehremanî bi sedsalan jî di bîreweriya gelêrî da zindî ma[6].




[4] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 7/495 - 510. Ibin Al Athir, El-Kamel fi al Tarix, 5/66 - 69. Al Zahabi, Tarix Al Islam, 3/599, 605

[5] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 8/29 - 32. Ibin Al Athir, El-Kamel fi Al Tarix, 5/66 - 69. Al Zahabi, Tarix Al Islam, 3/805.

[6] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 8/135 - 144. Al Maqdisi, Al Bidih we Al Tarix, 6/97. Ibin Al Athir, El-Kamel fi al Tarix, 5/211 - 223. Al Zahabi, Tarix Al Islam, 4/271 - 274.

**4- Serhildana Curcan**: Ev şoreş di sala 162-ê goçî (778-ê z.) da li herêma *Curcan*, li bakur-rojhilartê Îrana niha bi rêveberiya mirovekî ku jêra *Ebdul Qehhar* digotin pêkhat. Li gor gotûbêjeka din jêra *Ebdul Wehhab* gotine. Piraniya serhildêran ji cotkarên Xûramiye bûn û ew bi navê Sorkerî hatine naskirin, ji ber ku cil û bergên sor li xwe dikirn û rengê sor ji xwe ra kiribûn durişim. *Dewleta Ebbasî* ev şoreş jî têkbir, rêber û alîgirên wî jî tev kuştin[7].

**5- Raperîna Azerbeycanê**: Ev şoreşa di sala 192-ê goçî (807-ê z.) da li Azerbeycanê pêkhat. Wê hîngê xelîfe *Harûn El Reşîd* li ser text bû. Ji serhildêran ra *Xûramiye* dihate gotin. Piştî çend şeran leşkerê xelîfe zora serhildêran bir, ji wan dora 30000 (sîhhezar) mirov kuştin, jin û zarokên wan kirin sebiye. Dîlên şer jî ajotin bajarê Kermanşahê ku xelîfe *Harûn* li wir dema aramiyê derbas dikir. Wî ferman da ku dîlên şer bêne kuştin, jin û zarok li bazarên koleyan (nexaseyê) bêne firoştin[8].




Tiştê hevpar di navbera van şoreşan da ewe ku hemû jî şoreşên niştîmanî-gelêrî bûn û bi rêveberiyên niştîmanî bûn. Armancên van şoreşan hem civakî û hem jî *ayînî-yezdanî* bûn (ew ayîna hên berî zerdeştiyê). Ev rastî ji me ra baş dide xuyakirin ku rah û damarên ayîna *niştîmanî-ariyanî* di bîreweriya beşekî mezin da ji gelên *Ariyanî* hên zindî mabû. Van gelan ayîna xwe ya *neteweyî-niştîmanî* wek baweriyeka li hember Îslametiyê didît. Ev şopa gelên *Ariyanî* di şoreşa mezin da ku *Babekê Xûramî* birêve bir, gihîşte kop û bandeva xwe ya bilind.

[7] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 8/143. Al Maqdisi, Al Bidih we Al Tarix, 6/98. Ibin Al Athir, El-Kamel fi Al Tarix, 5/223 - 230. Al Zahabi, Tarix Al Islam, 4/273.
[8] Al Tabari, Tarix Al Tabari, 8/339. Al Maqdisi, Al Bidih we Al Tarix, 6/103. Ibin Al Athir, El-Kamel fi al Tarix, 5/384.